EĞİTİM SEN
Eğitim ve Bilim Emekçileri Sendikası Education and Science Workers' Union

# 21'Ê REŞEMIYÊ ROJA ZIMANÊ DAYÎKÊ YA CÎHANÊ PÎROZ BE!

Rêxistina Perwerdehî, Zanist û Çandê ya Neteweyên Yekbûyî (UNESCO), sala 1999'an bi biryarekê; 21'ê Reşemiyê wekî "Roja Zimanê Dayîkê ya Navneteweyî" pejirandiye. "21'ê Reşemiyê Roja Zimanê Dayîkê ya Navneteweyî" cara yekemîn bi armanca piştgiriya jiyana pirzimanî û pirçandiyê sala 2000'î hatiye destpêkirin ku were pîrozkirin.

Li gorî daneyên UNESCO'yê li ser cîhanê 5 hezar jê zimanên binecih bi tevahî ji 7 hezaran zêdetir bi zimanan tê peyivîn; lê belê ji van zimanan ji sedî 40'ên wan bi tunebûnê re rû bi rû ne. Li gorî UNESCO'yê heke di nava sed salan de, zimanekî ku ji hêla zarokekê/î ve nikaribe were axaftin; ew ziman di xetereyê de ye û heke zimanekî ku ji hêla tu zarokan ve neyê axaftin ew ziman hêdî mirî ye tê pejirandin. Li gorî Atlasa Cîhanê ya Zimanên ku Di Bin Xetereyê De Ne, li Tirkiyeyê 18 ziman an tune bûne an jî di bin xetereya tunebûnê de ne.

Di Peymana Mafên Zarokan a Neteweyên Yekbûyî de, di xala 30. de wisa dinivîse: "Li dewletên ku di nav wan de kêmarên ji netew, ol an jî zimanên cuda pêk tên hene; zarokên ku ji wan kêmaran in an jî binecihên wî welatî ne, ji bo ku tev li civaka xwe bibin, bi zimanê xwe bipeyivin, pêdiviyên ola xwe bînin cih û çanda xwe bijîn nikarin werin astengkirin.

Ji aliyê zarokan ve, temenê di navbera 0-6'an de; wekî heyameke ku bi tevahî geşbûna jîrahiyê hatiye temamkirin û fêmkirin û naskirina têkiliyên xwe û derdorê ye. Tê zanîn, geşbûna jîrahiyê her çi qas bi geşbûna taybetmendiyên fêmkirin û geşbûna serkeftinê re û irsîtiyê re pêwendîdar be jî; pêşveçûna wê bi binyata aborî, civakî û çandî ya hawirdora ku tê de tê jiyîn ve pêwendîdar e. Di vê merhaleyê de tiştê ku di geşbûna zarok/ê de diyarker e, jiyara nalbatê ye. Di heyama pêşdibistanê de zarok tenê bi zimanê ku hîn bûye ango bi zimanê dayîkê dipeyive. Bandora zimanê dayîkê yê li ser zarok/ê girêdayiyê fêrbûnên ji malbatê û derdorê ne.

Zarok di heyama ku merhaleye geşbûna jîrahiyê ya yekemîn qedandiye û geşbûna xwe didomîne û bi derûdora xwe re têkiliyên tekûztir daniye de, ango di temenê 2-6 saliya xwe de bi zimanekî ji zimanê dayîkê cudatir re rû bi rû dimîne. Salên berî dibistanê, navenda cîhana civakî û derûniya zarok/ê ye. Bi awayekî xwezayî; di vê heyamê de rastlêhatina zarok/ê ya zimanekî cuda, diyardeyeke ku li ser cîhana derûnî ya wî/wê rasterast bandorê dike ye. Di vê heyamê de zarok dikeve bin bandora navgînên ragihandinê yên çandî yên wekî radyo, televîzyonê û ev bandorlêkirin bi piranî bi awayekî neyînî ye. Ji ber ku zimanê van navgînan ji zimanê dayîkê yê zarok/ê cudatir e û tê nagihêje ku çi tê gotin; ev jî dibe sedem ku di kesayetiya zarok/ê de elametê nakokiyan ê pêşîn çê bibe.

Perwerdehiya bi zimanê dayîkê, fêrbûna zimanê duyemîn hêsantir dike û fêrbûna zimanê duyemîn jî zimanê dayîkê geştir dike. Tê zanîn; zarokên ku bi zimanê dayîkê tên perwerdekirin ji hêla xwendin, nivîsîn û xweîfadekirinê de bêtir bi pêş dikevin. Hatiye raçavkirin ku di bernameyên perwerdehiya bi cot zimanan ên ku gelek welatên cîhanê (Almanya, Fransa, Swîsre, Swêd, Holanda, DYA, Kanada, Belgîûm, Hindîstan, Afrîkaya Başûr) tên bikaranîn de, ziman hevdu xurt dikin û danûstandineke dualî ya dewlemendî pêk tînin.

Di pêvajoya kesan a xwebûniyê de, bandoreke mezin a zimanê dayîkê heye. Meriv bi zimanê dayîkê bêtir dikare danûstandinê bike û baştir tê bigihêje. Bi vêya ve girêdayî; perwerdehiya bi

zimanê dayikê ya ku di xwebûniya kesan de pir bi bandor e, heke bi awayekî çalak bê bikaranîn wê di warê perwerdehiyê de serkeftîtir bibe. Bêparbûna ji perwerdehiya zimanê dayîkê; ji aliyekî de dibe sedem ku bidestxistina destbikêriyên akademîk û serkeftina zarok/ê li gorî temenê xwe zehmettir dike; ji aliyekî din de jî bi taybetî di heyama gihayî de, ne tenê di warê ziman û destbikêriyan de, di pêvajoya geşbûna hestiyarî û civakî de jî bandoreke neyînî li ser zarok/ê dike.

Bicihanîna mafê perwerdehiyê ya rastîn, bi bicihanîna mafên din ên rastîn pêkan e. Ji ber wê jî li aliyekî tunehesibandina rêgezên bingehîn ên zanista perwerdehiyê û peymanên navneteweyî û qedexekirina perwerdehiya bi zimanê dayîkê; li aliyê din jî angaştina ku mafê perwerdehiyê tê dayîn tenê tê vê wateyê: Rastî tên berovajîkirin.

21'ê Reşemiyê Roja Zimanê Dayîkê ya Cîhanê, li welatê me di hawirdoreke ku bi milyonan zarokên ku bi taybetî jî zimanê wan ê dayîkê ne Tirkî ye lê Erebî, Kurdî, Lazkî, Hemşînî, Çerkezî û hwd. e û ji zimanê dayîka xwe hatine qetandin de, tê pîrozkirin. Her çi qas astengkirina zimanê dayîkê li ser takekesên civakê cur bi cur bandoreke neyînî bike jî, herî zêde li ser zarokan ên ku danûstandina xwe ya bi hawirdorê re tenê bi zimanê dayîka xwe dikin, bandoreke neyînî dike. Him ji hêla zimanzaniyê de him jî ji hêla zanistên perwerdehiyê de timî bipaşdexistina aliyên mirovî û pedagojîk ên zimanê dayîkê, li ser zarokan encamên nebaş tîne holê; tê dîtin ku zarokên zimanê wan ê dayîkê ji zimanê fermî cudatir e, ji warê fêrbûna destbikêriyan de du salan bi paş de dimînin.

Li hemberderketina hebûn, jiyan û fêrbûna zimanên dayîkê yên ji derveyî zimanê fermî; tê wateya lihemberderketina rêgeza herî bingehîn a zanista perwedehiyê û bi gelemperî nepejirandina zanistê. Tirkiye, bi cejna zarokan a ku di cîhanê de tenê ew pîroz dike dipesine; lê bi hinceta "Wê welat parçe bibe" perwerdehiya zimanê zikmakî ya bi milyonan zarokan asteng dike. Ev nakokiyeke mezin e.

Di 21'ê Reşemiyê Roja Zimanê Dayîkê ya Cîhanê de, bi milyonana zarok ji ber ku nikarin zimanê xwe yê dayîkê bi kar bînin û bi zimanê dayîkê nikarin perwerdehiyê bibînin; di serî de di pêvajoyên perwerdehiyê de ji hemû warên civakî bêpar dimînin. Divê astengiya li ser zimanên dayîkê yên cuda werin rakirin, ji bo her kes karibe bi zimanê dayîkê fêr bibe û perwerde bibe, rê were vekirin.

Em wekî Egitim-Sen, 21'ê Reşemiyê Roja Zimanê Dayîkê ya Cîhanê ya hemû gelên cîhanê û Tirkiyeyê pîroz dikin, em dixwazin astengiyên zagonî û yên kiryarî rabin û zimanên dayîkê û çandên cuda bi awayekî azad bijîn û geş bibin.

**LIJNEYA BIRÊVEBIRINA NAVENDÊ**